Sambola Pêdarî û Rizgariyê

Enehîte Murad

Di dema ku dagirkerên dewiletên xeribê (rojava)li dora perçên laşê imperetoriya osmanlî requsa serkefitinê dikirin,û bi ser wê de jî dewleta yonanê êrişên xwe li dû hev bê westan li ser tirkan gur dikirin û gelê Ermenî jî di wa destnavê de ji xwe re keys didîtin û şerê xwe li dij tirkan radigehand, daxweza wîleyeta (Qars) û (erdehan) dikirin.!

Di nêv va tovanê de dewalta tirk pêrişan û hejar diket, hema-hema jiyana dewleta tirkan li ber deriyê hilweşandinê bû! Di van merc û hoyên zor dijiwar de, (atatirk) bi holê dikevê ,ew bi hişmendî diponijî ku çareserîkê jî van serpêhatiyan re bibîne! Wî ji bilî gelê kurd tu çareserî nedidît? Her wisan jî, li seranserî gund û bajarên Kurdistana tirkiyê digeriya û gotinên gerim û balkêş weha digotin:

Ey gelê Kurd. birayên mislman! Va ye dagirkerên kafir û ne miroune birayên we tirk mislman dane ber xwe , û girînge win baş zanibin ku, daxwez û merema van kafiran ku mislmanan tev tarûmar bikin ! bêgûman ew cudahî di nêv bera mislmanên Tirik û Kurd de nîne lewre jî , bila win bawer bin ku îro bi soz û peyman ez sûnd dixim eger Kurd di va astengê de li rex birayên xwe Tirik alîkar bin, em Tirik tu carî qenciya we Kurdan ji bîra nakin û emê mafên we yên rewa û dadimend ji sînorên ku peymana Sîvir nîşan kirî bêtirî wê jî diyar û xelatî we bikin .! Ji ber ku Atatirk konevanekî pêlewan û hişmend bû lewre jî di destpêka tevgera xwe de bi awakî demuqras û mirovanî bi gelê Kurd re dida û distand , ta di hundir civatên xwe yên ne

aşkere û taybet, bi hevgirtina tereqî de jî mafên Kurd di hundir Tirkiyê de û hemû tevgera rêzgarîxweza kurd dipejirand û pîroz dikir . Loman jî, Kurd bi gotin û dirûşmên olî û balkêş bi hêsanî dihatine xopandin , bê erê û na bawerî bi wî dikirin û bi hezaran li derdora Atatirk diciviyan berên xwe didane şer, bi navên (cangoriyên Kurd), vêca jî li dijî Yonan şer û ceng lidardixistin . Wisan jî , li dawî bi darê zorê Yonan ji xaka Tirkiyê derdixistin, bi vî awî dewleta Tirik li ser pişta Kurdan ji nîrê dagîrkerên Îngilîz û Yonanê rêzgar dibûn . Lê mixabin temenê gotin û peymanên Atatirik dirêj nedikir . Piştî dewleta Tirik ji dagîrkerên Îngilîz û Yonan paqij û rêzgar dikir û pirsgirêka Ermenî jî bi nijadqurî bin cil dikir , bi vê awî li ser lingên xwe disekinî , pişt re bê şerim û fedî berê xwe dida Kurdan û ew bi qurşîn ,çekên sipî , girtin û H,W.D xelat û diyar dikir . Piştî wê Atatirik têkiliyên xwe bi dewletên xerbê re li saz dixistin , daku peymana Sîvir ya di sala -1920- an de ku çarenûsiya mafên gelê Kurd tê de hatibûn pejirandin , divê ew bête pişafitin û tinekirin. vêca jî ew peyman li dawî dihate çirandin û li şûn wê lihevkirina Lozanê di sala -1922-an de cî digirt û dicespî , ango jî , li

D.R.(10)